

Şewqiyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî: Berawirdkirinek li Ser Mulemme'ên Wan ên Çarzimanî

Shewqi-yi Khani on Pursuit of Ahmed-i Khani: A Comparison Between Their Four-Language Mulammas

Abdurrahman Adak*

PUXTE:

“Mulemma” ew helbest in ku ne bi zimanekî tenê, bi du yan jî zêdetir zimanan hatine nivîsîn. Di vê gotarê de mulemmayên Ehmedê Xanî (m. 1707) û Şewqiyê Xanî (sedsala XIXem) yên çarzimanî (‘Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdiya Kurmancî) hatine berawirdkirin. Di gotarê de pêşî metnên helbestan ên rexneyî hatin dayîn, piştê her du mulemma ji aliyê helbestvanên wan û taybetiyên ruxsarî û naverokî ve hatin berawirdkirin; Di encamê de hat dîtin ku rêjeya bandora Ehmedê Xanî, ji rêjeya orjînalîteya Şewqiyê Xanî gelekî zêdetir e. Mulemmaya Şewqiyê Xanî, ji bo mulemmaya Ehmedê Xanî, wek nezîreyekê jî dikare bê hesibandin. Ev jî dide nîşandan ku Ehmedê Xanî ne tenê bi riya berhemên xwe, wî her weha bi riya helbestên xwe jî bandor li yên pey xwe kiriye.

Bêjeyên sereke: Ehmedê Xanî, Şewqiyê Xanî, mulemme', nezîre, berawirdkirin.

ABSTRACT:

The poems that written in two or more languages are called “Mulemma”. In this article mulemmas of Ahmed-i Khani (Ehmedê Xanî-d.1707) and Shawqi-yi Khani (Şewqiyê Xanî- 19th Century) which were written in four languages (Arabic, Persian, Turkish and Kurmanji Kurdish) are compared. In the article firstly the critical texts of the poems are presented, later both mulemmas are compared in terms of their poets and structural and content features. As a result it was seen that the effect of Ehmedê Xanî was much more original

* **Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Mêrdîn, Turkiye**
Assoc. Prof. Mardin Artuklu University
Faculty of Literature, Department of
Kurdish Language and Literature, Mardin,
Turkey e-mail: abdurrahmanadak@gmail

than Shawqi-yi Khanî's. So that it can be said that the mulemma of the Şewqi is a nazirah (parallel) to Ehmedê Xanî's. This shows us that Ehmedê Xanî affected his successors not only with his works but also with his poems.

Keywords: Ahmed-i Khani, Shewqi-yi Khani, mulemma, nazirah, comparison.

1. DESTPÊK

Wek têgeheke edebiyata klasîk "mulemme" ew helbest in ku ne bi zimanekî tenê, bi du yan jî zêdetir zimanan hatine nivîsîn. Bi gotineke di eger di helbestekê de ji zimanên Kurdî, Farişî, 'Erebî, Tirkî hwd. du, sê, yan çar heb bi hev re bèn bikaranîn, ew helbest wek mulemme' tê binavkirin. Eger ew helbesta ku bi şeweya mulemme'ê hatiye nivîsîn bo nimûne "xezel" be, ji wê re "xezela mulemme", "murebbe" be, "murebbe'a mulemme" tê gotin (Kurtuluş û Pala, 2006: 539; Fesaî, 1373:109-114; Pala, 2003:352-353). Di tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk de ji aliyê gelek helbestvanan ve bi vê şeweyê helbest hatine nivîsîn. Wek Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Şewqiyê Xanî, Salim, Kurdî, Seydayê Xasî, Seydayê Licî, Kerbelayî û Mela Ehmedê Heyderî (Adak, 2016:447-448; Botî, 2012; Yıldırım, 2013). Ji van helbestvanan bi taybetî Ehmedê Xanî di warê mulemme'ê de deng vedaye. Lewra berî Xanî ne di edebiyata Kurdî tenê de, di çarçoveya edebiyatên 'Erebî, Farişî û Tirkî de jî bi piranî mulemme'ên du zimanî hatine nivîsîn (Kurtuluş û Pala, 2006:539). Lê Xanî mulemme'êke çarzimanî ('Erebî, Farişî, Tirkî û Kurdiya Kurmancî) nivîsiye û hûnera mulemme'ê gihandiyê asteke bilind. Loma bi rehetî dikare bê gotin ku ev yek di çarçoveya tevahiya edebiyatên rojhilatê de dahênanek e.

Ev mulemme'a Xanî di tarîxa edebiyata Kurdî de gelekî belav bûye û hatiye naskirin. Ev yek ji jimareke ne kêma nuxseyên wê yê destxet û çapkiri tê famkirin ku li jêrê di beşa danasîna nuxseyên wê de de li ser vê mijarê bê rawestan. Ev jî nîşan dide ku ev mulemme'a Xanî li xweşiya edebiyathezan çûye û ji aliyê wan ve hatiye ecibandin. Li vir pîrsek tê bîra mirov: Gelo li ser helbesteke ku di vê astê de hatiye ecibandin ji aliyê helbestvanên di ve tu "nezîre" nehatine nivîsîn? Lewra di tradîsyona helbesta klasîk de helbestên bi vî rengî wek model hatine dîtin û ji aliyê hin helbestvanan ve li ber wan helbestine nû hatine nivîsîn ku ji wan re "nezîre" tê gotin. Di nezîreyan de, bi piranî kêş, serwa, paşserwa, tema û hin îfade bi helbesta bingehîn re hevbeş in. Nezîrenûs, yan dixwazin bi nivîsîna helbesteke xweştir bidin pêşiya helbestvanê bingehîn, yan jî dixwazin rêza xwe jê re nîşan bidin û payeya wî bilind bikin (Durmuş; Köksal: Çiçekler, 2006:455-458). Sedem her çi be ferq nake, di vê rewşê de di navbera her du helbestvanan de danûstandinek çê dibe û bi termînolojiya zanista edebiyata berawirdî, helbestvanên bingehîn dibe şander (emetteur/gönderici) û nezîrenûs jî dibe wergir (recepteur/alıcı).

Eger em vegerin ser bersiva pirsaxwe, em dibînin ku ji helbestvanên mulemmê'nûsên navborî du heban li ser vê mulemmê'a Ehmedê Xanî nezîre nivîsîne. Ji van helbestvanan Şewqiyê Xanî mulemmê'êke çarzimanî û Seydayê Xasî jî mulemmê'êke pênczimanî nivîsîne ku her du jî ji aliyê pirzimanîyê û bikaranîna hunera telmîfê ve ji bo helbesta Xanî wek nezîre dikarin bînin hesabandin.

Guman tune ye ku di çarçoveya zanista edebiyata berawirdî de berawirdkirina mulemmê'a Ehmedê Xanî digel her du mulemmê'an, tesbîtîkirina xalên wan ên hevbeş û cîyawaz û tesbîtîkirina bandora Xanî li ser wan wek xaleke girîng derdikeve pêş. Lêbelê di vê gotarê de ji bo ku bi mulemmê'a Ehmedê Xanî re bê berawirdkirin, em dê mulemmê'a Şewqiyê Xanî tercihî ser ya Seydayê Xasî bikin. Sedemê vê jî ew e ku Şewqiyê Xanî ji aliyê zeman û mekan ve nêzîktirî Ehmedê Xanî ye. Lewra Şewqî ji aliyê ve berî Xasî ketiye bin bandora Ehmedê Xanî, ji aliyê ve jî herêma wî ya edebî nêzîktirî ya Xanî ye. Xaleke di ya ku rawestana li ser mulemmê'a Şewqî girîng didêre ew e ku Şewqî wek helbestvanekî kurdî di tarîxa edebiyata Kurdî de heta niha nenas maye. Danasîna helbestvanekî nenas û rawestana li ser mulemaya wî jî ji bo edebiyata Kurdî destkeft û awantajek e.

Di vê gotarê de mulemmê'ên Ehmedê Xanî û Şewqiyê Xanî dê di nav disîplîna edebiyata berawirdî de bînin berawirdkirin û mekanîzmaya berawirdkirinê dê bê îcrakirin. Çawa tê zanîn di mekanîzmaya berawirdkirinê de her du alî divê ji hev cihê bin. Loma danûstandinên navneteweyî ku di navbera du zimanên cihê de çê dibin gelekî bi nirx in. Dema em li mulemmê'ên Ehmedê Xanî û Şewqiyê Xanî dinêrin, erê ew ne bi du zimanên cihê hatine nivîsîn, lêbelê ew di du serdem û li du cihên cuda hatine nivîsîn ku ev jî li gor ekola Emerîkî dikeve nav kategoriya zanista edebiyata berawirdî (Aydın, 2008:20-21).

Ji ber ku berawirdkirina her du mulemmê'an dê li ser metnên wan bê kirin, neşra metnên wan dê bibe beşeke bîngehîna gotarê. Metnên mulemmê'an jî dê bi awayekî rexneyî bînin weşandin. Di amadekirina metnê rexneyî de, dê ji rêbaza berawirdkirina nuxxeyên destxet sûd bê wergirtin û ferqên di navbera nuxxeyan de jî dê di aparatên de bînin nîşandan. Di xebatên edebiyata berawirdî de zanîna zimanê duyem roleke mezîn hildigire. Ji bo ku metnekî neteweyî bi metnê neteweyeke di re bê berawirdkirin, yan divê zimanê wê neteweyê bê zanîn, yan jî divê ji wergeran sûd bê wergirtin. Di vê xebatê de me li ser metnên resen berawirdkirina xwe kiriye. Lêbelê ji bo kesên ku 'Erebî, Farisî û Tirkî nizanin me metnên her du mulemmê'an digel wergerên Kurdî yê van zimanan jî amade kiriye.

Di gotarê de berawirdkirina her du mulemmê'an dê ji aliyê helbestvanên wan û taybetiyên ruxsarî û naverokî yê mulemmê'an ve bê kirin. Di çarçoveya van qadan de wekhevî û cîyawaziyên wan, tiştên ku wergir/recepteur (Şewqiyê Xanî) jî şander/emetteur (Ehmedê Xanî) kopî kirine û aliyên wî yê orjînal dê bînin tesbîtîkirin.

Di berawirdkirina ji aliyê helbestvanan de, dê ji rêbaza vekolîna pozîtîvist sûd bê wergirtin ku di vê rêbazê de, vekolîna metnê edebî li ser esasê jînenîgariya nivîskar tê kirin (Aytaç, 2003:97). Loma ji di gotarê de jînenîgariya her du helbestvanan jî dê cih bigire. Ji ber ku Şewqiyê Xanî di tarîxa edebiyata Kurdî de heta niha nenas maye, li ser jînenîgariya wî bi berfirehî dê bê rawestan.

Di berawirdkirina ruxsarî û naverokî de, wek rêbaz em dê bi metnên her du mulemme'an ve girêdayî bimînin û bi awayekî tewsîfî/descriptive li ser esasên ruxsar û naveroka metnê berawirdkirinê bikin. Herçiqas ev rêbaz tradîsyonel e û ji ber ku tenê wesifandin li pêş e zêde meqbûl nehateyê dîtin jî, bi geneeta me ev rêbaz nikare bê piştguhkirin. Lewra ev rêbaz li gor rêbazên di di asta rêbazeke binemayî de ye û eger binema tunebe tiştek li ser nikare bê avakirin.

Di encamê de jî hevbeşî û ciyawazî, ast û rêjeya danûstandinê, bandora Ehmedê Xanî li ser Şewqiyê Xanî û asta orjînalîteya mulemme'a Şewqiyê Xanî dê bîn nirxandin û bi vê yekê ve girêdayî dê hin tesbît bîn kirin.

2. METNÊN HER DU MULEMME'AN

Herçiqas mulemme'a Ehmedê Xanî gelek caran hatiye weşandin jî, ji ber ku di berawirdkirina her du mulemme'an de metnên wan dê esas bîn girtin, pêwîst e digel metnê mulemme'a Şewqiyê Xanî metnê mulemme'a Ehmedê Xanî jî bê dayîn. Ji ber ku yê kevin û xwedî bandor Ehmedê Xanî ye, em dê pêşî cih bidin mulemme'a Ehmedê Xanî û piştê cih bidin mulemme'a Şewqiyê Xanî. Di neşra metnan de em dê pêşî nusxeyên wan ên destxet bidin nasandin, piştê jî bi awayekî berawirdî û bi nîşandana ferqên nusxeyan em dê metnekî rexneyî amade bikin. Ji aliyekî di ve ji bo ku mebest ji berawirdkirinê pêk were, pêwîst e misrayên 'Erebî, Farisî û Tirkî yên her du mulemme'an bi bal Kurdî ve bîn wergerandin. Loma jî em dê piştî metnên rexneyî, metnên wan ên ku wergerên Kurdî yên misrayên 'Erebî, Farisî û Tirkî dihewînin jî pêşkêş bikin.

2.1. Danasîna Nusxeyên Destxet

2.1.1. Nusxeyên Destxet ên Mulemme'a Ehmedê Xanî

Heta niha metnê mulemme'a Ehmedê Xanî ji aliyê kesên wek Abdurrahman Durre (2002: 28), Ebdullah Varlı (2004:160-162), Kadri Yıldırım (2011:39-40) û Ebdulhadî Tîmurtaş (Botî, 2012) ve bi alfabeya Kurdî ya latînî û ji aliyê Perwîz Cîhanî (1363:7-8) û Tehsîn Î. Doskî (2005:220) ve jî bi alfabeya Kurdî ya 'Erebî hatiye deşîfrekirin û weşandin. Lê Abdurrahman Durre ne tê de, yên di cih nedane nusxeyên destxet ên vê mulemme'ê. Niha di destê me de sê nusxeyên destxet ên mulemme'a Xanî hene. Li jêrê em dê van nusxeyan bidin nasandin û di pêvekê de jî cih bidin wêneyên wan.

1. Nusxeya Şêx Ehmedê Feqîr

Ev nusxe, di dîwana Şêx Ehmedê Feqîr (w. piştî 1832an ne bi gelekî) de cih digire¹ û ji aliyê wî ve hatiye îstînsaxkirin. Şêx Ehmedê Feqîr dîwana xwe di sala 1237/1821ê de xilas kiriye.² Ji kaxez û xetê wê aşîkar e ku ev ji nusxeyên dî kevintir e (Bnr. PÊVEK-I).

2. Nusxeya Cewzî

Ev nusxe, ji aliyê Mela Ehmedê Cewzî (w. 2000) ve hatiye îstînsaxkirin û ji aliyê Abdurrahman Durre (w. 2012) ve hatiye weşandin (Durre:441). Serdema mustensixê wê nişan dide ku ev nusxe piştî nusxeya Şêx Ehmedê Feqîr e û nusxeyeke nû ye. Ev yek Ji kaxez û xetê wê jî tê fêmkirin (Bnr. PÊVEK-II).

3. Nusxeya Qoxî

Ev nusxe, di sala 2004an de ji aliyê Mela Ehmedê Qoxî ve di mecmûeya helbestan a bi navê *Dîwana Camî* de hatiye weşandin (Qoxî, 2004:375-376). Mustensixê wê, Qoxî bi xwe ye. (Bnr. PÊVEK-III).

Ji aliyê ferqên nusxeyan ve, nusxeyên Cewzî û Qoxî zêdetir nêzî hev in. Loma ew her du şaxek in û nusxeya Şêx Ehmedê Feqîr jî şaxek e. Ji her du şaxan şaxa Şêx Ehmedê Feqîr zêdetir nêzî rastiyê dixuye.

2.1.2. Nusxeyên Destxet ên Mulemmê'a Şewqiyê Xanî

Di destê me de sê nusxeyên destxet ên mulemmê'a Şewqiyê Xanî hene. Li jêrê em dê van nusxeyan bidin nasandin û di pêvekê de jî cih bidin wêneyên wan.

1. Nusxeya Bexdayê

Ev nusxe di nav dîwana Şewqî de cih digire ku ji aliyê kurê wî Mihemed Tewfiq ve hatiye nivîsîn. Nivîser ev nusxe di bîstê Rebî'ul-axira sala 1330ê mişextî de ku beramberî heştê Nîsana sala 1912a zayînî tê, li medreseya Meydanê ya Colemêrgê, li ber nusxeya bavê xwe nivîsiye (Bnr. PÊVEK-IV).

2. Nusxeyên Qoxî

Ev nusxeya mulemmê'a Şewqiyê Xanî, ji aliyê Mela Ehmedê Qoxî ve, herî dereng di sala 1986an de hatiye nivîsîn (Qoxî:376-377). Li gorî agahiyên ku Zeynelabidîn Zinar dane me, metnê vê nusxeyê ji aliyê Qoxî ve ji wî re hatiye şandin. Ev metn niha jî li cem Zinar tê parastin û li ser daxwaza me ji aliyê Zinar ve ji me re hat şandin³. Qoxî, piştê di sala 2004an de mecmûeya xwe ya bi navê *Dîwana Camî*

1 Bnr. Şêx Ehmedê Feqîr, *Dîwan*, Nusxeya Fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a A. Adak, wr. 167a.

2 Ji bo agahiyên berfireh derheqê Şêx Ehmedê Feqîr û dîwana wî bnr. Adak, bn. r. 334-339.

3 Ji bo şandina destxeta mulemmê'a Şewqiyê Xanîneseb, ez spasîyên ji dil pêşkêşî Z. Zinar dikim. Li vir divê bê gotin ku Zinar, di berhema xwe ya bi navê *Nimûne ji*

çap kiriye û di wir de cih daye metnê mulemme'ê jî. Lê Qoxî di vir de helbest ji nû ve nenivîsiye, heman metnê ku ji Zinar re şandiye di berhemê de bi cih kiriye. Dema mirov li van her du metnan dinêre, bi awayekî aşîkar tê dîtîn ku her du metn di binemaya xwe de yek in. Di her du metnan de jî misrayên Farisî di şeweya xetê Farisî de ne û ji bilî wê jî dirûvên xetên her du metnan bi tevahî yek in. Tenê Qoxî, di nusxeya *Dîwana Camî'* de li ser “, /Waw”ên ku dengê “o”yê didin kumik danîne. (Bnr. PÊVEK V & PÊVEK VI).

Bi rehetî dikare bê gotin ku nusxeya Qoxî û ya Bexdayê ji heman jêderê tèn. Lewra di navbera wan de tu cîyawzî tune ye. Lêbelê em nizanin gelo çavkaniya Qoxî ev nusxeya Bexdayê ye, yan nusxeyeke din e. Dibe ku wî ji vê nusxeya Bexdayê, ji nusxeyeke din a dîwana Şewqî, yan jî ji mecmu'eyeke helbestan ku mulemme'a Şewqî jî tê cih digire sûd wergirtibe. Lêbelê ev jêder ne diyar e.

2.2. Metnên Rexneyî

Ji bo ku metnên zanistî yên bi edîsyon krîtîk ên her du mulemme'an derkevin holê, di amadekirina metnên wan de ev xalên jêrîn li ber çavan hatin girtin:

1. Di amadekirina metnên her du mulemme'an de, tenê nusxeyên destxet ên ku li jorê hatin nasandin, esas hatin girtin. Bêguman di paşerojê de bi komkirina hemû nusxeyên destxet, belkî ji bi peydakirina nusxeyên muellif, pêkan e ku metnên tekûztir bên amadekirin û encamên baştir bên bidestxistin.

2. Di derbaskirina helbestan ji herfên 'Erebî bal bi herfên latîni ve alfabeya transkrîpsiyonê ya navneteweyî hat bikaranîn.

3. Ji ber ku di her du mulemme'an de zimanên 'Erebî û zimanên Farisî jî hene, ji bo dengdêrên kurt (hereke) û dengdêrên dirêj (herfên medê) ên alfabeya 'Erebî û Farisî, formên navneteweyî hatin tercîhkirin. Çawa ku tê zanîn di weşanên zanistî yên navneteweyî de Ser/Fethe () bi “a”yê, Ber/Demme () bi “u”yê û Cir/Kesre () bi “i”yê; /Elîf bi “Ä”yê, /Waw, bi “ÿ”, /Yê bi “î”yê tèn nîşandan. Bi mebesta ku di tevahiya helbestan de ahengek hebe, me ev sistem di misrayên Kurdî de jî bi kar anî.

4. Ji ber ku di bikaranînên navneteweyî de, beramberî “ç”ya 'Erebî, hem “Ò/ò”, hem jî “X/x”; û beramberî “ق”a 'Erebî, hem “Ú/ú”, hem jî “Q/q” tèn nîşandan, me jî formên wan ên ku di alfabeya Kurdî ya latîni de jî tèn bi kar anîn (“X/x”, “Q/q”) tercîh kirin.

Gencîneya Çanda Qedexekirî (Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stockholm 1991, r. 104-105) de latîniya vê nusxeyê jî weşandiye.

5. Herfên dî yên ‘Erebî û muqabilên wan ên transkripsiyonê jî ev in:

ث	: Ş>ş	ط	: Tṭ
ح	: Hḥ	ظ	: Zẓ
ذ	: Zẓ	ع	: ‘
ص	: Şş	غ	: Ğğ
ض	: Zẓ	أ	: ’
ض	: Dḍ		

5. Metnê mulemmê’a Xanî, li ber her du nusxeyên destxet, ku li jorê hatibûn danasîn, hat amadekirin. Di amadekirina wê de rêbazên edîsyon krîtîkê hatin şopandin. Di nişandana cudahiyan nuxxeyan de ji bo nusxeya Şêx Ehmedê Feqîr (F), ji bo nusxeya Cewzî (C) û ji bo nusxeya Mela Ehmedê Qoxî (Q) hat bikaranîn. Heçî mulemmê’a Şewqiyê Xanî ye, ji ber ku her du nusxeyên wê di binemaya xwe de yek in, di metnê wê de cudahiyan nuxxeyan nehatin nişandan.

2.2.1. Mulemmê’a Ehmedê Xanî

a) Metnê Rexneyî

Fâ‘ ilâtun fâ‘ ilâtun fâ‘ ilâtun fâ‘ ilun

- 1 Fâta ‘umrî fi hawâka yâ ḥabîbî kulla ḥâl
Ah û nâlem hamdamam şod dar firâqat mâh û sâl
Ger benim qanım dilersen çoqtan olmuştur ḥalâl
Dîn û abtar bûm ji ‘ işqđ min namâ ‘ aql û kamâl⁴
- 2 Anta fikrî fi fuadî, anta rûḥî fi’l-casad
Laşkarđ ğamhâyî to mulkî dilam wîrâne kerd
Dâde geldim ‘ işq elinden isterem sizden meded
Wân tatârân bir bi yağmâ ‘ aql û dîn û mulk û mâl⁵

4 1a ḥabîbî] xeyalî F

1b hamdamam] hamdam C

5 2c ‘ işq elinden] pâdişahum F; sizden] senden F

2d bir bi yağmâ] birne yağmâ C, Q

- 3 Tāla ğammī zāde hammī şā'a sirrī fi'l-malā
Taşnaî cāmī wisālem çun şahīdī Karbalā
Yoqsa sen dīwāne oldun n'oldī hālin ey dilā
Yā ji nū ve 'işwayak da te ḥabībā çāvğazāl⁶
- 4 Mittu hicrānen ḥabībī lasta minnī 'āliman
Mordem az dardī firāqat ġāfil ī az ḥālī man
Cān ū dilden 'arz(i) qıldım ḥālimi cānāne men
J' 'arzđḥālā min tu ġāfil qāt na pursī 'arzđḥāl⁷
- 5 Hal lanā min ni'mati wasli'l-ḥabībī min naşīb
Ūf(i)tādam bar darat biçāra sargardān ġarīb
Derdimiz çoq līk(i) senden özge yoq hīç bir ṭabīb
Ay ṭabībā min dawāê dardê **Xānī** har wisāl⁸

b) Mulemme'a Xanî Digel Wergera Kurdî ya Misrayên 'Erebî, Farisî û Tirkî

- 1 Temenê min her daîm di evîna te de beyhûde derbas bû, ey dilber!
Ji firqeta te, ah û nalînên min bi meh û salan bi min re dom kirin.
Eger tu xwîna min bixwazî, ew zû de ye ji te re bûye helal.
Dîn û ebter bûm ji 'eşqê min nema 'eql û kemal
- 2 Tu yî hizra min di dilê min de, tu yî rihê min di cesed de.
Leşkerê derdên te, milkê dilê min wêran kir.
Ji ber cewra işqê ez hatim edaletê, ez ji we arikariyê dixwazim.
Wan tetaran bir bi yexma 'eql û dîn û milk û mal

-
- 6 3a Tāla ğammī zāde hammī] Tāla hammī nāla ğammī F;
3b şahīdī] Ḥusaynī F
3c n'oldī hālin] nice ḥālim C; oldun n'oldī hālin] oldum nice ḥālim Q
3d te] min C, Q
- 7 4a mittu hicrānen] bittu hāciran C, bittu hicrānen Q; 'āliman] 'ālimā F
4b Mordem] Har dam C, Q; ġāfil ī] ġāfilam C; ḥālī man] ḥālī mā F
4c men] mā F
4d J' 'arzđḥālā] 'arzđḥālā F, Q; 'arzđḥāl] ġawrdḥāl F
- 8 5a ni'mati wasli'l-ḥabībī] ni'mati'l-wasli ḥabībī F
5c özge] öte C, Q
5 d ṭabībā] ṭabībđ C, Q

- 3 Xemgîniya min dirêj bû, derdê min zêde bû û sîrrê min belav bû.
Mîna şehîdê Kerbelayê têhniyê şeraba wîsala te me.
Ey dil! Yan tu dîn bûyî, ev çi halê te ye?
Yan ji nû ve eşweyek da te hebîba çavxezal
- 4 Ey dilbera min, ji xelkê dûr li min bû şev, tu ji min ne haydar î.
Ez ji derdê dûrmayîna ji te mirim, lê tu ji halê min xafil î.
Min ji dilberê re halê xwe ji can û dil erz kir.
J' 'erzêhala min tu xafil qet ne pûrsî 'erzêhal
- 5 Gelo, ji nîmeta gihîştinadilberê dê nesîbê me hebe?
Bêçare, perîşan û xerîb ketime ber deriyê te.
Derdên me zehf in, lê ji bilî te ti tebîbekî dî nîne.
Ey tebîba min dewaê derdê **Xanî** her wîsal

2.2.2. Mulemmê'a Şewqiyê Xanî⁹

a) Metnê Rexneyî

Fâ' ilâtun fâ' ilâtun fâ' ilâtun fâ' ilun

- 1 Hûbbuka afnâ şabâbî yâ habîbî fi't-ta' ab
'Işqî to bag'dâxt(i) cānam dar cafâ û tâb û tab
'Aql û hûşum qalmaqadî şabr û qararim gitti hep
Şotima j'dâgâ firâqê law dinâlim roz û şab
- 2 Qad mađâ fi'l hacri 'umrî yâ habîbî 'lîf binâ
Māndaam bî yâr û bî ğamxwâr(i) dar ranc û 'anâ
Gormişem bir gün vişâlin neylerim genc û ğinâ
Ger nebînim dilberê min bo çi ne nāv û laqab?
- 3 Laysa li'l-'uşşâqî maqşûdun siwâ waşli'l-ħabîb
Z'ârazoyî waşli gul bâşad figānî 'andalîb
Dilberin waşli diler 'aşîq 'alâ raġmi'r-raqîb
Ġayrê waşlâ dilbarê 'aşîq çu dî nâkit ŧalab

9 Di nusxeya destxet a helbestê de ku ji aliyê Mela Ehmedê Qoxî ve hatiye nivîsandin, weki sernavê helbestê ifadeya "Çargoşeya Şewqiyê Xanîneseb" hatiye bikaranîn. Lê ji ber ku ev sernav di metnê orjînal de tuneye û ji aliyê Qoxî ve hatiye nivîsîn, me li vir cih neda vî sernavî.

- 4 Qāla lî “Min ayna ci `ta?”, qultu “Min şahri`l-firāq”
Goft(i) “Kālāyî to?”, goftam “Dard û miħnat iştiyāq”
Söyledi “Dermān?”, dedim “Waşlın”, dedi “Mecnūna baq”
“Tālibê waşlā mi dê şābir bitin şāhib `adab”
- 5 Munzu adlā xāliqū`l-arwāħi rūhī fi`l-casad
Nārī `işqam dar dilī sūzān nihāda tā abad
İsterim maqşūdumu senden ilāhī qıl meded
Dā bibinim rüyê dilbar bê hicāb û bê naşab
- 6 Rabbana` ğfir zanba man nācāke bi`l-qalbi`s-salīm
Kird(i)gārā raħm(i) kon bar bandeê pîr û saqīm
Fazl û iħsānın diler bîçāre qulun yā Kerīm
Dā bi fazlā xwe `afūkî **Şawqiyê Xāninasab**

b) Mulemme`a Şewqiyê Xanî Digel Wergera Kurdî ya Misrayên `Erebî, Farisî û Tirkî

- 1 Evîna te kir ku ciwaniya min di nav te`bê de beyhûde biçe, ey dilber.
Evîna te dilê min xiste nav cefa û elemê.
Eql û hişê min neman, sebr û qerara min hemû çû.
Sotime j` daxa firaqê lew dinalim roz û şeb
- 2 Temenê min di nav dûriyê de derbas bû, ey dilber, li me were rehmê.
Ez bê dilber û bê xemxwar di nav derd û zehmetiyê de mame.
Piştî ku min rojekê wîsala te dîtiye, ez ê çi bikim ji xezîne û dewlemendiyê?
Ger nebînim dilberê min bo çi ne nav û leqeb?
- 3 Ji bilî gihîştina dilberê tu meqseda aşiqan tuneye.
Nalînên bilbilan ji xwestina gihîştina gulê çêdibin.
Evindar, digel ku reqîb dijberiyê jî dike, gihîştina dilberê dixwaze.
Xeyrê wesla dilberê aşiq çu dî nakit teleb
- 4 Ji min pirs kir: *Tu ji ku derê hati?*, min got: *Ji bajarê firaqê.*
Got: *Malê te çi ye?*, min got: *Derd, êş û iştiaq.*
Got: *Derman çi ye?*, min got: *Wesla te ye.*, got: *Li vî dîni binêre.*
Talibê wesla mi dê sabir bitin sahibedeb

- 5 Ji roja ku aferînerê rihan rihê min xistiye cesed de.
Agirê evîna min, heta bi ebedê, di dilê bişewat de hatiye danîn.
Ey îlahê min, ez meqsûda xwe ji te dixwazim, were hewara min.
Da bibînim rûyê dilber bê hîcab û bê neseb

- 6 Ey Rebbê me, gunehê wî kesê ku bi qelbê selîm lavayî te dike bixefirîne.
Ya Rebbê min, rehmê li bendeyê xwe yê pîr û nexweş bike.
Ey Rebbê kerîm, bendeyê te yê bêçare, fezl û qenciya te dixwaze.
Da bi fezla xwe 'efûkî **Şewqiyê Xanîneseb**

3. BERAWIRDKIRINA HER DU MULEMME'AN JI ALIYÊ HELBESTVANÊN WAN VE

3.1. Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî, di sala 1651ê de, li Bazîdê hatiye dinyayê. Malbata wî, di sedsala XV'an de ji herêma Hekariyê koçî Wanê, ji wir jî koçî Bazîdê kiriye. Bavê wî Mela Îlyas û birayê wî Mela Qasim wek katibên dîwana mîrên Bazîdê xebitîne. Xanî jî piştî wan di dema mîr Mihemed Pîrbelalî de ev wezîfe domandiye. Xanî, piştî ku bavê wî wefat kiriye, li cem birayê xwe yê mezin Mela Qasim dest bi xwendinê kiriye. Piştre çûye Muradiyeyê û li wir li medreseya Gulgûnê xwendiyê. Xanî li gelek deverên din jî xwendiyê û îczeta xwe li Xoşabê li Medreseya Etaiyeyê li cem Mela Camî stendiye. Piştre li Bazîdê medreseyek ava kiriye û di wê medreseyê de dersdarî kiriye. Xanî qet nezewiciye û di derûdora sala 1707an de li Bazîdê wefat kiriye.

Ehmedê Xanî çar berhem nivîsîne ku hemû jî ji bo edebiyata Kurdî gelekî bi nirx in. Xanî di sala 1683yan de bi navê “Nûbihara Biçûkan” ferhengeke Kurdî-‘Erebî amade kiriye. Di sala 1687an de jî bi navê “Eqîdeya Îmanê” berhemeke dînî nivîsiye. Beriya Xanî di medreseyên kurdan de pirtûkên ‘Erebî dihatin xwendin. Xanî bi nivîsîna van berheman xwestiyê ku pirtûkên Kurdî bikevin nav mufredata perwerdeyê. Xanî herweha dîwaneke helbestan jî nivîsiye û di van helbestên xwe de hestên xwe yê derûnî bi awayekî edebî îfade kirine.

Ehmedê Xanî di sala 1694an de berhema xwe ya bi navê “Mem û Zîn”ê nivîsiye. Di vê berhemê de li ser çîroka evîni ya Mem û Zînê rawestiyaye. Di destpêka berhemê de jî li ser rewşa kurdan a wê serdemê sekiniye û ji bo pêşvebirina ziman û edebiyata Kurdî behsa pêwistiya padişahêkî Kurd kiriye. Xanî bi van hizr û berhemen xwe tesîreke mezin li kurdên pey xwe kiriye (Varlî, 2004:36-241; Durre,10-19; Yıldırım,2008:13-33).

3.2. Şewqiyê Xanî

Şewqiyê Xanî, heta niha di berhemen bingehîn ên tarîxa edebiyata Kurdî de cih negirtiye û ji bo cihana kurdolojiyê nenas maye. Herçiqaq mulemme'a wî ji

aliyê Mela Ehmedê Qoxî (2004:376-377) û Zeynelabidîn Zinar (1991:104-105) ve hatiye weşandin ji, li ser zanyariyên nasnameya wî nehatiye rawestan. Tenê Zinar, ji îfadeya helbestvan a bi şêweya “Şewqiyê Xanîneseb”, gihîştîye wê encamê ku ew ji malbata Ehmedê Xanî ye (Zinar, 1991:104-105). Abdurrahman Adak jî di çarçoveya vê têbîniya Zinar de behsa helbestvan kiriye û ew wek şopgerekî Xanî daye nişandan (Adak, 2016: 295-301). Mihemed ‘Elî Qeredaxî, em ji hebûna dîwana Şewqî agahdar kirine û destnîşan kiriye ku nusxeyeke destxet a dîwana wî li Bexdayê ye (Qeredaxî, 1998: 131-132). Peyre Tehsîn Îbrahim Doskî dîwana Şewqî ji Bexdayê bi dest xistiye û di gotara xwe ya bi sernavê “Mela Mihemedê Xanî (Şewqî) û Dîwana Wî” helbestvanê me û dîwana wî dane nasandin (Doskî, 2016: 24-51). Bi vê gotara Doskî zanyariyên derheqê Şewqî de ronî bûne ku em ê jî di nasandina helbestvan de piştî xwe bidin vê gotarê.

Helbestvanê me, di qeyda “temmet”ê a dîwana xwe de, ji aliyê nivîserê dîwanê ve wek “Mela Mihemed Şewqiyê Colemêrgîyê Xaniyê Xalidî” hatiye nasandin ku ji vê qeydê zanyariyên derheqê nav, pişe, mexles, bajar, eşîr û terîqeta wî de ronî dibin. Li gor vê navê helbestvan Mihemed e. Şewqî jî mexlesa wî ya helbestê ye. Ew niştecihê Colemêrgê ye û ji eşîra Xanî ye. Eşîra Xanî yek ji eşîrên devera Hekariyan e ku navenda wê gundê “Xana Sê Gundan” a navçeya Çelê ye. Hêjayî gotinê ye ku helbestvanên navdar Ehmedê Xanî jî wek binema endamê vê eşîrê ne. Bi vî awayî piştî Ehmedê Xanî, Şewqiyê Xanî jî dibe helbestvanekî duyem ku xwe wek “Xanî” daye nasandin. Helbestvan di mulemme’a xwe de ku mijara vê gotarê ye, mexlesa xwe û eşîra xwe weha bi kar aniyê: “Da bi fezla xwe efûkî **Şewqiyê Xanîneseb**”. Helbestvan, di vê benda jêrîn a ku ji helbesteke wî ya Kurmancî hatiye wergirtin nav, mexles û eşîra xwe bi hev re bi kar anîne:

Mihemed Şewqiyê Xanî

Tu pîrbêjek bi ezmanî

Bes in şekwa ji dewranî

Bi kes nabet wefaê qet

Di vê benda jêrîn a ku ji helbesteke wî ya Farisî hatiye wergirtin de jî navê herêma Hekarî, bajarê Colemêrgê, eşîra Xanî û mexlesa wî bi hev re derbas dibin.

Bilbilî baxî **Hekarî** ‘endelîbî **Culemêrg**

Tutî şeker efsanî ez **aşiyani Xaniyan**

Şemî’ bezmî ‘aşiqan ra şifteî perwane îst

Saqîî suhbaî nezm û **Şewqî** ‘ezebu’l- beyan

Dîsa li gor qeyda temmetê em têdigihin ku helbestvanê me wek pişe melatî kiriye. Ji vê jî derdikeve holê ku wî di medreseyên Kurdistanê yê wê demê de perwerde dîtîye, îcazet stendiye û dawiyê jî melatî kiriye. Ji mulemme’a wî jî ku mijara vê

gotarê ye, em têdigihin ku perwerdeya wî di asteke bilind de ye. Bikaranîna çarzi-manan (‘Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdî) bi tena serê xwe ji bo gihîştina vê qeneetê bes e. Lewra ji bo ku helbestvan bikaribe zimanê ‘Erebî di helbestê de bi kar bîne, pêwîst e di medreseyê de perwerdeya ‘Erebî dîtibe ku ev ji bo serdema wî tiştêkî asayî ye. Herweha ji bo ku bikaribe Farisî bi kar bîne, pêwîst e berhemên edebî yên Farisî xwendîbin û bi Farisî re eleqedar be. Ev jî di medreseyên serdema wî de guncaw bû. Dîsa ji bo ku bikaribe Tirkî bi kar bîne, pêwîst e bi awayekî têkiliya wî bi saziyên fermî yên Osmaniyan re çêbûbe û fêrî Tirkîya Osmanî bûbe. Ev her sê xal bi me didin zanîn ku Şewqiyê Xanî li gorî serdema xwe di warên curbicur de perwerde dîtîye û asta wî ya rewşenbîriyê gelekî bilind bûye.

Xala dawî jî ew e ku helbestvan yek ji pêgirtiyên terîqeta Neqşebendîtiya Xalidî ye ku bi bal Mewlana Xalidê Şarezorî (m. 1826) ve tê nisbetkirin. Di dîwana wî de du texmîs jî hene ku vê yekê piştrast û ronî dikin. Texmîsek ji van li ser helbesteke Farisî ya Şêx ‘Ubeydullahê Nehrî (m. 1882) ye, ya dî jî li ser ser helbesteke Şemseddîn Efendî Mistefazadeyê Başkalî ye ku tê de medhê Şêx Fehîmê kurê ‘Ebdulhemîdê kurê ‘Ebdurrehmanê Erwasî (1825-1895) tê dayîn. Ji van jî tê fêmkirin ku helbestvan ji peyrewên Şêx Ubeydullahê Nehrî û Şêx Fehîmê Arwasî ye. Şêx Ubeydullahê Nehrî kurê Seyîd Tahayê Nehrî, Şêx Fehîmê Arwasî jî yek ji xelîfeyên Seyîd Tahayê Nehrî ye. Seyîd Tahayê Nehrî jî xelîfeyê Mewlana Xalid e.¹⁰

Eger em li serdema helbestvan binêrin, ji hin nîşaneyan tê famkirin ku ew di nîveka duyem a sedsala XIXem de jiyaye. Ew nîşane jî ev in: 1. Di texmîsên wî de navên Şêx ‘Ubeydullahê Nehrî (m. 1882) û Şêx Fehîmê Arwasî (m. 1895) derbas dibin. Ev jî nîşan dide ku Şewqî nikare bibe helbestvanê sedsala XVIIIem. Lewra wî, yan di serdema van kesan de, yan jî piştî wan ev texmîs nivîsîne. 2. Şewqî di helbesteke xwe de medhê sultanê Osmanî ‘Ebdulhemîdê duyem daye. Ji vê jî tê fêmkirin ku wî ev medhiyeya xwe di maweya desthilatdariya wî de ku beramberî 1876-1909an tê nivîsiye. 3. Di helbestekê de dema behsa feqîtiya xwe kiriye, behsa Mela Mihemed Tahîrê Maî jî kiriye ku Maî di sala 1850î de hatiye dinyayê. 4. Kurê wî Mihemed Tewfîq, dîwana bavê xwe di sala 1330/1912an de ji bo hevalê xwe Mela Mihemedê kurê Hacî Îbrahîmê Bendî îstînsax kiriye. Ji vê jî dikare bê famkirin ku helbestvan di wê salê de ne li heyatê ye.

Şewqî helbestvanekî xwedî dîwan e. Nusxeyeke destxet a dîwana wî li Bexdayê tê parastin. Li gor agahiyên ku di qeyda temmetê ya dîwanê de cih digirin, kurê helbestvanê me Mihemed Tewfîq ev nusxe di bîstê Rebî’ul-axira sala 1330ê mişextî de ku beramberî heştê Nîsana sala 1912a zayînî tê, ji bo hevalê xwe Mela Mihemedê

10 Ji bo agahiyên berfireh derheqê Seyîd Tahayê Nehrî de bnr. M. Şefik Korkusuz, *Nehrî’den Hazne’ye Meşayîhi Nakşibendî*, Kilim Matbaacılık, İst. 2010, r. 11-38.

kurê Hacî Îbrahîmê Bendî, li medreseya Meydanê ya Colemêrgê, li ber nusxeya bavê xwe nivîsiye. Herweha li gor agahiyên di vir de Şewqî navê dîwana xwe kiriye “Yadîgar”.

Li gor vê nusxeyê dîwan ji 230 rûpelan pêk tê û tê de 100 helbest hene. 95 ji van helbestan bi Farisî, sê bi Kurdî, yek bi Tirkî û yek ji mulemme'êke çarzimanî ye. Çawa ku tê dîtîn di dîwanê de helbestên Şewqî yên Kurdî kêma in. Lêbelê bi navê “Beyta Heşrê” menzûmeya wî ya di jî heye ku ew ji bi Kurdî nivîsiye. Ev menzûmeya wî dirêj e û 52 beytên musemmet pêk tê. Tehsîn Doskî ev menzûme di du mecmû'eyên helbestan de ku li Bexdayê tînan parastin tesbît kiriye. Ev jî nîşan dide ku hebûna helbestine di ku Şewqî bi Kurdî nivîsîne pêkan e (Doskî, 2016: 24-51).

3.3. Berawirdkirin

Dema em li helbestvanên her du mulemme'an (Ehmedê Xanî û Şewqiyê Xanî) dinêrin, em dibînin ku her du jî helbestvanên serdema klasîk in. Her du jî Kurmancîaxêf in. Her du jî ji eşîra Xanî ya herêma Colemêrgê ne. Her duyan jî di medreseyan de perwerde dîtine û îcazet/destûrname standine. Her du jî bi elîtên serdema xwe re di nav tîkiliyê de ne. Ehmedê Xanî bi mîrên Bazîdê re, Şewqiyê Xanî jî bi malbata Şêx Ubeydullahê Nehrî re di nav tîkiliyê de ye. Her du helbestvan jî ji bilî Kurdî bi qasî helbestê binivîsin ‘Erebî, Farisî û Tirkî dizanin. Ev yek ji mulemme'ên wan tê famkirin. Her du helbestvan jî mutesewif in û ji terîqeta Neqşebendiyye ne. Her duyan jî bi Kurdî berhemên edebî nivîsîne. Ev tev xalên hevbeş ên Ehmedê Xanî û Şewqiyê Xanî ne.

Di navbera her du helbestvanan de cîyawazî jî hene. Ehmedê Xanî helbestvanê serdema mîrektîyan, Şewqiyê Xanî helbestvanê serdema piştî mîrektîyan û dawîya Osmanîyan ne. Di serdema Xanî de mîr hebûn, lêbelê di serdema Şewqî de şêxên Neqşebendiyan rola mîran dilîstin. Her du jî ji eşîra Xanî ya herêma Colemêrgê ne, lêbelê Ehmedê Xanî ji herêma xwe dûr ketiye û ew bûye xelkê Bazîdê. Heçî Şewqiyê Xanî ye ew di hînterlanda eşîra xwe de maye û wî jiyana xwe li Colemêrgê borandiye. Loma Ehmedê Xanî xwe bi devoka Colemêrgê sînora nekiriye¹¹, lêbelê Şewqiyê Xanî di mulemme'a xwe de devoka Colemêrgê bi kar anîye. Her duyan di medreseyan de perwerde dîtine, lêbelê Xanî di medreseyan mîrektî û began de, Şewqî jî –bi ihtîmaleke mezin- di medreseyan Neqşebendiyan Xalidî de perwerde dîtiye. Tîkiliya her duyan jî bi terîqeta Neqşebendîtiyê re heye. Lêbelê tîkiliya Ehmedê Xanî bi Neqşebendîtiyê re lawaz e, lê ya Şewqiyê Xanî gelekî bi hêz e. Ehmedê Xanî wek mela nehatiye naskirin, lêbelê Şewqî wek mela hatiye naskirin. Xanî girîngiyeke

11 Xanî, di Memû Zînê de jî xwe bi devokê sînora nekiriye. Çawa ku ew dibêje wî di Mem û Zînê de sê devok bi kar anîne ku ew jî devokên Botan, Mamedî û Silvî ne. Bnr. Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amad. Huseyn Şemrexî, Nûbihar, Stenbol 2009, r. 283.

taybet bi Kurdî daye û di warên cuda de berhemên Kurdî nivîsine û hemû berhemên wî jî di warên xwe de orjînal in. Heçî Şewqî ye, herçiqas Menzûmeya Heşrê di cureya xwe de nû ye jî, wî di warên ziman, edebiyat hwd. berhemên orjînal nedane. Berhemên wî klasîk in. Şewqî wek Xanî girîngiyêke taybet bi Kurdî nedaye, dîwana xwe bi piranî bi zimanê Farisî nivîsiye. Ehmedê Xanî yek ji navdartirîn helbestvanên edebiyata Kurdî ye. Lêbelê berevajiyê wî Şewqiyê Xanî heta niha nenas maye ku ev cara pêşî ye zanyariyên derheqê wî de li Bakur aşkera dibin.

Çawa tê dîtîn di navbera her du helbestvanan de bi qasî xalên hevbeş, xalên ciyawaz jî hene. Xalên hevbeş gelek in, lêbelê dema mirov li hûrgiliyên wan xalan dinêre di piraniya wan xalan de jî ciyawazî hene. Ji ber vê yekê ciyawaziyên wan jî hevbeşiyên gelekî zêdetir dixuyin. Loma jî her du mulemmê' di van şert û mercan de, ji aliyê du helbestvanan ve hatine nivîsîn ku bi piranî xwediyê taybetiyên ciyawaz in. Şewqiyê Xanî, heta niha nenas maye û ev cara pêşî ye ku zanyariyên derheqê wî de li Bakur tên weşandin.

4. BERAWIRDKIRÎNA HER DU MULEMME'AN JI ALIYÊ RUXSARÊ VE

4.1. Taybetiyên Ruxsarî yên Mulemmê'a Ehmedê Xanî

Mulemmê'a Ehmedê Xanî, ji aliyê teşeyên nezmê ve ji koma musemmetan e û bi teşeya murebbe'ê hatiye nivîsîn. Ev murebbe' jî pênc bendan, her bendên wê jî ji çar misrayan pêk hatine. Benda yekem a murebbe'ê di nav xwe de hemserwa ye, yanî şemaya serwaya wê "aaaa" ye. Heçî bendên peyrew in, her sê misrayên pêşî di nav xwe de, misrayên dawî jî bi benda yekem re hemserwa ne. Yanî şemaya serwaya wan bendan bi şiklê "bbba" yê ye. Dengê serwayê "âl" e, cureya wê jî serwaya murdef e. Ji ber ku misrayên dawî yên murebbe'ê tenê bi serwayê bi hev ve hatine girêdan, helbest di teşeya murebbe'êke muzdewic de ye.

Mulemmê'a Xanî bi kêşa 'erûzê ji behra Remelê bi qalibê "Fâ' ilâtun fâ' ilâtun fâ' ilâtun fâ' ilun" hatiye nivîsîn ku ev qalib di helbesta Kurdî ya klasîk de di rewacê de ye. Xanî, di bikaranîna 'erûzê de serkeftî ye. Dikare bê gotin ku ji aliyê îmale û zîhafan ve qusûrên helbestvan nînin. Ev serkeftina wî di her çar zimanan de jî tê çavdêrikirin.

Di mulemmê'a Xanî de hunera telmî'ê hatiye bikaranîn. Loma helbest ne bi zimanekî tenê hatiye nivîsîn. Xanî di vê helbestê de çar ziman ('Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdî) bi hev re û bi qasî hev bi kar anîne. Di her bendeke helbestê de ku ji çar misrayan pêk hatiye, bi rêzê cih daye zimanên 'Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdî. Bi vî awayî helbesta Xanî, dikeve kategoriya murebbe'êke mulemmê' de. Bi rehetî dikare bê gotin ku Xanî di bikaranîna zimanên 'Erebî, Farisî û Tirkî di helbestê de bi qasî Kurdî serkeftî ye.

Kurdiya ku Xanî di misrayên Kurdî de bi kar aniyê kurdiya Kurmancî ye û xwerû ye. Herçiqas hinek peyvên 'Erebî û Farisî hebin jî, hevoksaziya Kurdî bi wan peyvên nefetisiye û çêja Kurdî di wan de zal e. Di misrayên Kurdî de xwe bi devokêkê bi sînor nekiriye.

4.2. Taybetiyên Ruxsarî yên Mulemme'a Şewqiyê Xanî

Şewqiyê Xanî, mulemme'a xwe bi teşeya murebbe'ê nivîsiye. Ji bo vê yekê jî di nusxeya destxet a Qoxî de îfadeya "Çargoşeya Şewqiyê Xanîneseb", wate "Murebbe'a Şewqiyê Xanîneseb" wek sernavê helbestê hatiye bikaranîn. Ev murebbe'a helbestvanê me ji şeş bendan, her bendên wê jî ji çar misrayan pêk hatine. Şemaya serwaya benda yekem "aaaa" û şemaya serwaya bendên peyrew jî "bbba" ye. Dengê serwayê "ab" e, cureya wê jî serwaya mucerred e. Ji ber ku misrayên dawî yên murebbe'ê tenê bi serwayê bi hev hatine girêdan, helbest murebbe'êke muzdewic e.

Mulemme'a Şewqiyê Xanî, bi kêşa 'erûzê hatiye nivîsîn. Kêşa wê jî behra Remelê qalibê "Fâ' ilâtun fâ' ilâtun fâ' ilâtun fâ' ilun" e. Helbestvan, kêşa 'erûzê, ne di misrayên Kurdî tenê de, di misrayên 'Erebî, Farisî û Tirkî de jî bi awayekî serkeftî îcra kiriye û helbesta wî jî aliyê îmale û zîhafan ve bê qusûr e.

Di helbesta Şewqiyê Xanî de hunera telmî'ê hatiye îcrakirin, loma jî helbest murebbe'êke mulemme' e. Helbest bi çar zimanan hatiye nivîsîn û di hemû bendên wê de bi rêzê zimanên 'Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdî hatine bikaranîn. Helbestvan di bikaranîna zimanên 'Erebî, Farisî û Tirkî de bi qasî Kurdî serkeftî ye.

Di misrayên Kurdî yên helbestê de kurmanciyêke xwerû û herikbar hatiye bikaranîn. Peyvên 'Erebî û Farisî, ji mu'tadê ne zêdetir in. Misrayên Kurdî taybetiyên devoka Hekarî/Behdînan di xwe de dihewînin. Formên daçek û lêkeran ên ku di îfadeyên "min bo çi ne nāv û laqab?" "aşiq çu dî nākîr talab" "Tālibê waşlā mi dē şābir bitin" de hatine bikaranîn, wê yekê bi awayekî zelal radixin ber çavan.

4.3. Berawirdkirin

Eger her du mulemme', ji aliyê ruxsar û vegotinê ve xal bi xal bîn berawirdkirin, encameke weha derdikeve holê:

Her du mulemme' jî;

Ji aliyê **yekeya nezmê** ve, li ser esasê bendan hatine nivîsîn.

Ji aliyê **teşeya nezmê** ve, bi teşeya "murebbe'a muzdewic" hatine nivîsîn. Lê murebbe'a Xanî ji pênc bendan, ya Şewqiyê Xanî ji şeş bendan pêk hatiye.

Ji aliyê **Serwayê** ve, li gorî sîstema serwaya murebbe'an hatine serwakirin. Lêbelê serwayên wan ne hevpar in.

Ji aliyê **kêşê** ve, bi kêşa 'erûzê ji behra Remelê bi qalibê "Fâ' ilâtun fâ' ilâtun fâ' ilâtun fâ' ilun" (Remela meqsûr û musemmen) hatine nivîsîn.

Ji aliyê **şêweyê** ve, bi şêweya mulemmê û bi hunera telmîê hatine nivîsîn. Di hemû bendan de bi rêzê zimanên ‘Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdî hatine bikaranîn.

Ji aliyê **ziman û devokê** ve, (di çarçoveya misrayên Kurdî de) bi kurdiya Kurmancî hatine nivîsîn. Di van misrayên kurdiya Kurmancî de; li cem Ehmedê Xanî taybetiyên devoka Serhedê, lê li cem Şewqiyê Xanî taybetiyên devoka Colmêrgê xuya dikin.

Çawa tê dîtin ji aliyê taybetiyên ruxsarî ve her du mulemmê‘ ji bilî jimara bendan û devokên wan bi piranî hevbeş in.

5. BERAWIRDKIRINA HER DU MULEMME‘AN JI ALIYÊ NAVEROKÊ VE

Her du mulemmê‘ jî ji aliyê naverokê ve helbestên lîrîk û aşiqane ne. Di her duyan de jî mijar, dûrmayîna ji dilberê û daxwaza gihîştina wê ye. Di gelek cihan de heman mijar bi heman îfadeyan, yan jî bi îfadeyên nêzî hev hatine pêşkêşkirin. Ji ber ku ji hevbeşiyên ruxsarî zêdetir, hevbeşiyên di wate û îfadeyan de, dê têtikiliya her du mulemmê‘an û danûstandina her du helbestvanan baştir derxe holê, pêwîst e li ser vê xalê bi hûrgilî bê rawestan. Li jêrê her du mulemmê‘, di vê çarçoveyê de dê bînan analîzkirin.

Eger bi baldarî li bendên pêşî yê her du mulemmê‘an bê nêrîn, dê hevbeşiya di wate û îfadeyê de û hevbeşiya ahenga yekpareyî di her du bendan de bi awayekî zelal bê dîtin.

Ehmedê Xanî:

Fâta ‘ umrî fi hawâka yâ habîbî kulla hâl
 Ah û nâlem hamdamam şod dar firâqat mäh û sâl
 Ger benim qanım dilersen çoqtan olmuştur hâlâl
 Dîn û abtar bûm ji ‘ işqđ min namâ ‘ aql û kamâl

Şewqiyê Xanî:

Hıbbuka afnâ şabâbî yâ habîbî fi ‘t-ta‘ ab
 ‘ İşqî to bag‘dâxt(i) cânâm dar cafâ û tâb û tab
 ‘ Aql û hûşum qalmanı şabr û qararım gitti hep
 Şotima j’ dâgâ firâqđ law dinâlim roz û şab

Ji aliyê wate û îfadeyê ve hevbeşiya di van her du bendan de di nav sê xalan de dikare bê destnîşankirin:

• **Xala Yekem:**

Ehmedê Xanî:

Fâta ‘ umrî fi hawâka yâ habîbî kulla hâl
 (Temenê min her dem di evîna te de derbas bû, ey dilber!)

Şewqiyê Xanî:

Hubbuka afnâ şabâbî yâ habîbî fi't-ta' ab

(*Evîna te, kir ku ciwaniya min di nav te' bê de beyhûde biçe, ey dilber.*)

Di van misrayan de peyva “hewa”yê li cem Xanî û peyva “hubb”ê li cem Şewqiyê Xanî, du peyvên ‘Erebî yên hemwate ne ku hezjêkirin û evînê îfade dikin. Li gorî her du helbestvanan jî temenê wan bi evîndariya dilberê bihûriye. Li aliyekî Xanî dibêje, “*Temenê min her dem di evîna te de beyhûde derbas bû.*”, li aliyê dî jî Şewqiyê Xanî dibêje: “*Evîna te kir ku ciwaniya min di nav te' bê de beyhûde biçe*”. Di encamê de her du jî heman tiştê îfade dikin.

Di vê hevbeşiyê de du tişt balê dikişînin: Yek jê ew e ku ev misrayên hevbeş, di her duyan de jî misrayên yekem ên helbestê ne. Ya dî jî ew e ku hevbeşiyê di her duyan de jî di misrayên ‘Erebî de rû daye. Yanî Şewqiyê Xanî jî wek Xanî bi heman wate û bi heman zimanî dest bi helbesta xwe kiriye. Herweha Şewqiyê Xanî dema di misraya yekem a benda duyem a mulemme' a xwe de dibêje “*Temenê min di nav dûriyê de derbas bû, ey dilber*”, dîsa behsa dûrmayîna ji dilberê dike. Ev wate jî di misraya yekem a mulemme' a Xanî de bi awayekî veşartî heye. Lewra derbasbûna temen bi awayekî beyhûde, dûrmayîna ji dilberê jî di xwe de dihevine. Naxwe Şewqiyê Xanî di vê misrayê de jî heman mijarê vedibêje. Dîsa divê bal bê kişandin ku ev misra jî wek her duyan dî bi ‘Erebî ye.

- **Xala Duyem:**

Ehmedê Xanî:

Dîn û abtar bûm ji ‘işqî min namâ ‘aql û kamâl

Şewqiyê Xanî:

‘Aql û hûşum qalmaidî şabr û qararim gitti hep

(*Eql û hişê min neman, sebr û qerara min hemû çû.*)

Di van her du misrayan de heman wate, bi du zimanên cihê hatiye îfadekirin. Misraya Xanî bi Kurdî, misraya Şewqiyê Xanî jî bi Tirkî ye. Di her du misrayan de jî bi awayekî nîzamî û li pey hev behsa heman mijarê tê kirin. Bi gotineke dî di her du misrayan de jî, îfadeyên pêşî û îfadeyên dawiyê hemwate ne. Di îfadeyên pêşî de Xanî dibêje “*Dîn û ebter bûm ji ‘eşqê*”, Şewqiyê Xanî jî dibêje “*Eql û hişê min neman*”. Di îfadeyên duyem de, Xanî dibêje “*Min nema ‘eql û kemal*”, Şewqiyê Xanî jî dibêje “*Sebr û qerara min hemû çû*”. Aşîkar e ku îfadeyên Xanî û Şewqiyê Xanî, bi du zimanên cihê jî bin, heman wateyê didin.

• **Xala Sêyem:**

Ehmedê Xanî:

Ah û nâlem hamdamam şod dar firâqat mäh û sâl

(Ji firqeta te, ah û nalînên min bi meh û salan bi min re dom kirin.)

Şewqiyê Xanî:

Şotima j' dâgâ firâqê law dinâlim roz û şab

Di van her du misrayan de Xanî bi Farisî û Şewqiyê Xanî jî bi Kurdî dibêjin ku bi sebeb firaqa ji dilberê (**Xanî:** dar firâqat, **Şewqiyê Xanî:** dâgâ firâqê), her daîm ew di nav nalînan de ne (**Xanî:** Ah û nâlem hamdamam şod, **Şewqiyê Xanî:** dinâlim roz û şab). Çawa ku tê dîtîn, her du helbestvan bi heman uslûbê behsa heman tiştî dikin.

Di bendên peyrew de her du helbestvan jî rawestana xwe li ser mijara dûrmayîna ji dilberê didomînin. Wek mînak;

Ehmedê Xani:

Bittu hâciran habîbî lasta minnî 'âliman

(Ey dilbera min, ji xelkê dûr li min bû şev, tu ji min ne haydar î.)

Mordem az dardî firâqat gâfil î az hâlî man

(Ez ji derdê dûrmayîna ji te mirim, lê tu ji halê min xafil î.)

Şewqiyê Xanî:

Qad maqâ fi'l hacri ' umrî yâ habîbî 'lîf binâ

(Temenê min di nav dûriyê de derbas bû, ey dilber, li me were rehmê.)

Qâla lî "min ayna ci 'ta?", qultu "min şahri'l-firâq"

(Ji min pirs kir: Tu ji ku derê hatî?, min got: Ji bajarê firaqê.)

Piştî ku her du helbestvan di bendên peyrew de rawestana li ser mijara dûrmayîna ji dilberê didomînin û gilî û gazine xwe yên di vî warî de tînin zimên, îcar behsa gihîştinê dikin û di vî warî de jî hizr û hisên xwe tînin zimên. Wek;

Ehmedê Xanî:

Taşnaî cāmî wisâlem çûn şahîdî Karbalâ

(Mîna şehîdê Kerbelayê têhniyê şeraba wîsala te me.)

Şewqiyê Xanî:

Gormişem bir gün vişâlin neylerim genc û ğinâ

(Piştî ku min rojekê wîsala te dîtiye, ez ê çî bikim ji xezîne û dewlemendiye?)

Tê çavdêrikirin ku Şewqiyê Xanî, temaya helbesta xwe di du xalan de ji ya Ehmedê Xanî berfirehtir kiriye û pêşdetir biriye.

1. Şewqiyê Xanî, di îfadekirina temaya dûrmayîna ji dilberê de, serî li metoda diyalogê jî daye ku di mulemme'a Xanî de ev rêbaz tune. Wî tevahiya bendekê, ku ji çar misrayên pîrziimanî pêk tê, ji diyaloga di navbera xwe û dilberê re veqetandiye.

Qāla lî “Min ayna ci ’ta?”, qultu “Min şahri’l-firāq”
Goft(i) “Kālāyî to?”, goftam “Dard û miḥnat iştīyāq”
Söyledi “Dermān?”, dedim “Waşlın”, dedi “Mecnûna baq”
“Ṭalībê waşlā mi dê şābir bitin şāhib ’adab”

Wergera bi Kurdiya Kurmancî ya Misrayên ‘Erebî, Farisî û Tirkî

Ji min pîrs kir: *Tu ji ku derê hatî?*, Min got: *Ji bajarê firaqê.*

Got: *Malê te çî ye?*, Min got: *Derd, êş û iştīyaq.*

Got: *Derman çî ye?*, Min got: *Wesla te ye.* Got: *Li vî dînî binêre.*

Talibê wesla mi dê sabir bitin sahibedeb

2. Ehmedê Xanî, mulemme'a xwe wek “erzêhalekê” pêşkêşî yarê kiriye, di tevahiya helbestê de berê xwe daye yarê û xîtaba xwe qet neguherandiye. Lê Şewqiyê Xanî, di dawîya mulemme'a xwe de ku wek xatîmeyê dikare bê hesibandin, xîtaba xwe ji dilberê guherandiye û berê xwe daye Xwedê:

Rabbana' ğfir zanba man nâcāke bi'l-qalbi's-salîm

Kird(i)gārā raḥm(i) kon bar banded pîr û saqîm

Fazl û iḥsānın diler bîçāre qulun yā Kerîm

Dā bi fazlā xwe 'afûkî **Şawqiyê Xānînasab**

Wergera bi Kurdiya Kurmancî ya Misrayên ‘Erebî, Farisî û Tirkî

Ey rebbê me, gunehê wî kesê ku bi qelbê selîm lavayî te dike bixefirîne.

Ya rebbê min, rehmê li bendeyên xwe yê pîr û nexweş bike.

Ey rebbê kerîm, bendeyê te yê bêçare, fezl û qenciya te dixwaze.

*Da bi fezla xwe 'efûkî **Şewqiyê Xanîneseb***

Şewqiyê Xanî, li vê derê ji bêçaretiyê dua kiriye, lave û gazeyên xwe anîne zimên û daxwaza bexşandina xwe kiriye. Dikare bê gotin ku Şewqiyê Xanî bi awayekî tesewîfî tevgeriyaye. Ew bi tevahî teslîmî îradeya Xwedê bûye û Xwedê çî bike jê razî ye. Lewra, digel hemû daxwazên wî, piştî ku negihîştîye dilberê, êdî teslîm bûye û ev wek qedera xwe qebûl kiriye û hew daxwaza gihîştina dilberê kiriye. Di dawîya dawiyê de wî mexfîret, rehm, fezl, îhsan û efwa Xwedê xwestiye. Herwekî ku Şewqiyê Xanî, nebûna duayê di mulemmê'a Xanî de wek kêmasiyekê tesbît kiriye û bi kirina vê duaeyê ev kêmasî tamam kiriye. Belkî jî sebeb ev e ku mulemmê'a wî bi bendekê ji ya Xanî zêdetir e.

Misraya yekem a benda sêyem a mulemmê'a Şewqiyê Xanî jî (Laysa li'l-'uşşâqi maqşûdun siwâ waşli'l-ḥabîb/Ji bilî gihîştina dilberê ti meqseda aşiqan tune), bi vê mijarê re têkildar e. Herwekî ku Şewqiyê Xanî, di vê misrayê de bersivê dide misraya yekem a benda dawî ya mulemmê'a Xanî: Xanî pirs dike, “Hal lanâ min ni'mati wasli'l-ḥabîbi min naşîb/Gelo, ji nimeta gihîştina dilberê dê nesîbê me hebe?”, Şewqiyê Xanî jî weha bersivê dide: “Ji bilî gihîştina dilberê ti meqseda aşiqan tune.” Şewqiyê Xanî li vir bi awayekî hunerî bi Xanî re muxatebeyekê dike û herwekî ku Xanî li hember wî ye; bersivê dide pirsê wî û hizra xwe tîne zimên. Çawa ku tê dîtîn, dema ku Xanî dibêje, “Gelo, ji nimeta gihîştina dilberê dê nesîbê me hebe?”, ew gihîştina dilberê wek ni'metekî dibîne û bi riya pirsê daxwaz û xweziya xwe ya zêde ji bo gihîştina wê derdibire. Şewqiyê Xanî jî vê hizra wî dupat dike û dibêje ku “Ji bilî gihîştina dilberê ti meqseda aşiqan tune.” Lê belê her wek ku Şewqiyê Xanî bibêje ku meqseda wî gihîştina dilberê ye, lê ev ji wî re bibe nesîb jî û nebe nesîb jî ferq nake. Şewqiyê Xanî li vir jî xwe teslîmî îradeya Xwedê kiriye. Lê Ehmedê Xanî bi bikaranîna peyva “nesîb”ê, dixwaze ku gihîştina dilberê bibe nesîbê wî.

Çawa tê dîtîn ji aliyê naverokî ve hevbeşiyên di navbera her du mulemmê'an de gelek in û pir balkêş in. Ev jî bandora Ehmedê Xanî bi awayekî aşkera nîşan dide. Lêbelê çawa ku Şewqiyê ev tişt ji Ehmedê Xanî stendine, hin tiştên orjînal jî li helbesta xwe zêde kirine. Bi giştî di vî warî de hevbeşî ji ciyawaziyên zêdetir in.

6. ENCAM

Berawirdkirina mulemmê'ên Ehmedê Xanî û Şewqiyê Xanî di çarçoveya sê qadan de dikare bê kirin: Helbestvan, ruxsara helbestê û naveroka wê. Dema em li helbestvanên her du mulemmê'an dinêrin, em dibînin ku her du jî helbestvanên serdema klasîk in, bi elîtên serdema xwe re di nav têkiliyê de ne û endamên medrese û terîqetan in. Lêbelê sedsal, bajar, medrese, têkiliya bi terîqetê re, putepêdana bi hizra Kurdî û taybetiyên fonetîkî yê berhemên wan ji hev cuda ne. Loma jî her du mulemmê' ji aliyê du helbestvanan ve hatine nivîsîn ku piraniya taybetiyên wan ji hev cihê ne. Ji ciyawaziyên wan xala herî girîng jî ew e ku Ehmedê Xanî

helbestvanekî xwedî berhem e û yek ji navdartirîn helbestvanên edebiyata Kurdî ye. Lêbelê berevajiyê wî Şewqiyê Xanî ne helbestvanekî xwedî berhem e û heta niha nenas maye. Ev cara pêşî ye ku zanyariyên derheqê wî de li Bakur aşkera dibin.

Dema mirov ji aliyê ruxsar û vegotinê ve li xalên berawirdkirinê dinêre, derdikeve holê ku her du mulemme' jî ji aliyên yekeya nezmê, teşeya nezmê, serwa, kêş û şeweyê ve hevpar in. Di hûnguliyên van xalan de di navbera her du mulemme'an de sê cudahî tên dîtin: 1. Mulemme'a Ehmedê Xanî murebbe'ke pêncbendî ye, lê ya Şewqiyê Xanî şeşbendî ye. 2. Her du mulemme' jî li gorî sistema serwaya murebbe'an hatine serwakirin, lê dengê serwayê û cureya wê cuda ne. 3. Xanî devoka Serhedê, lê Şewqiyê Xanî devoka Colmêrgê bi kar aniyê. Ji van cudahiyan, cudahiya di devokê de tiştekî asayî ye. Eger em her du cudahiyên di yên biçûk jî daynin aliyekî, di nav mulemme'a Ehmedê Xanî û mulemme'a Şewqiyê Xanî de, rêjeya hevbeşiyê di asteke bilind de ye. Ev jî wek şander (emetteur/gönderici) bandora Ehmedê Xanî ya li ser Şewqiyê Xanî bi awayekî aşîkar nişan dide.

Ji aliyekî di ve ev rewş têgeha “nezîre”yê tîne bîra mirov. Çawa ku tê zanîn, di edebiyata klasîk de, helbestên ku bi teşe, kêş, serwa û paşserwaya hebesteke di hatine nivîsîn wek “nezîre” tên binavkirin. Dema em asta bilind a hevbeşiyên her du mulemme'an li ber çavan bigirin, mulemme'a Şewqiyê Xanî jî, ji bo mulemme'a Xanî, wek nezîreyekê dikare bê hesabandin. Lewra ji bili hevbeşiya serwayê, di hemû unsurên di yên tenzîrê de hevbeşiya her du mulemme'an heye. Lêbelê ji ber ku helbesta Şewqiyê Xanî hemû unsurên tenzîrê di xwe de nahewîne, ev helbesta wî wek “nezîreyeke netam” dikare bê nirxandin.

Herçiqas tenzîr ne tam jî be, hevbeşiyên her du mulemme'an, ji hevbeşiyên nezîreyekê gelekî zêdetir in. Lewra ji bili xalên tenzîrê yên navborî, her du helbest ji aliyê şeweyê ve jî hevbeş in ku ew jî şeweya telmîfê ye. Di tarîxa edebiyata Kurdî de yek ji nûnerên herî girîng ê şeweya mulemme'ê Ehmedê Xanî ye. Lewra Xanî, di mulemme'a xwe de ne du ziman (Farisî û Kurdî, yan 'Erebî û Kurdî), çar ziman ('Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdî) bi hev re bi kar anîne ku ev di tarîxa edebiyata Kurdî de tiştekî nû û ojînal e. Guman tune ye ku helbestvanê me Şewqiyê Xanî, di bikaranîna çar zimanan de jî di bin bandora Ehmedê Xanî de maye û li pey şopa wî çûye. Şewqiyê Xanî, ji bili ruxsar û şeweya helbestê, di naverok, bikaranîna wate û îfadeyan de jî ketiye bin bandora Xanî ku di beşa wê de bi firehî li ser vê mijarê hat rawestan.

Di mulemme'a Şewqiyê Xanî de hebûna diyaloga di navbera evîndar û dilberê de û guherandina xîtabê bi bal Xwedê ve, wek orjînalîte, xweserî û zêdehiyên Şewqiyê Xanî derdikevin pêş. Lêbelê bi giştî rêjeya bandora Ehmedê Xanî, ji rêjeya orjînalîteya Şewqiyê Xanî gelekî zêdetir e. Di encamê de ev yek asta bandora Ehmedê Ehmedê Xanî li ser Şewqiyê Xanî û şopgeriya Şewqiyê Xanî bo wî bi awayekî zelal dedixe

holê. Wek encameke vê xebatê eger em vê tesbîtê jî bikin dê ne şaş be: Ehmedê Xanî ne tenê bi riya berhemên xwe; wî herweha bi riya helbestên xwe jî bandor li yên pey xwe kiriye. Bi gotineke dî Xanî ne bi mesnewiyên evînî, ferheng û eqîdenameyên menzûm tenê, ew herweha bi hin şêwe û stîlên ku di helbestên xwe de bi kar anîne jî bûye xwedî bandor. Çawa ku hin helbestvan bi riya “Mem û Zîn”ê, hin bi riya “Nûbihara Biçûkan” û hin jî bi riya “Eqîdeya Îmanê” li pey şopa wî çûne, hinek jî bi riya helbestên wî yên orjînal li pey şopa wî çûne ku Şewqiyê Xanî ji bo vê yekê nimûneyeke gelekî girîng û orjînal e.

7. ÇAVKANÎ

- Adak, A. (2016). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik* (çapa sêyem). Stenbol: Weşanên Nûbihar
- Aydın, K. (2003). *Karşılaştırmalı Edebiyat Günümüz Postmodern Bağlamında Algılanışı*. Birey, (2. baskı), İstanbul: Birey Yay.
- Aytaç, G. (2003). *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilim*, İstanbul: Say Yay.
- Jonathan C. (2007). *Yazın Kuramı*. H.Gür (wer.), Ankara: Dost.
- Botî, A. (2012). “Di Şîra Kurdî De Mulemmê/Pir-zimanî: Mînaka Ehmedê Xanî”, *Nûbihar* j. 107.
- Doskî, T. Î. (2005). *Cewahiru'l-Meânî fî Şerhi Dîwani Ehmed el-Xanî*, Dihok: Spîrêz.
- Doskî, T. Î. (2007). *el-Molla Xelîl es-Sêrtî we Menhecuhu fî Îsbati'l-'Eqaidi'l-Îslamiyye*, Erbil: Spîrêz.
- Doskî, T. Î. (2016). “Mela Mihemedê Xanî (Şewqî) û Dîwana Wî”. *Kovara Waar Dîrok*, j. 11.
- Durmuş, İ; M. Fatih K., Mustafa Ç. (2006). “Nazîre”, *DÎA*, İstanbul.
- Durre, A. (2002). *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî*. Stenbol: Keskesor.
- Fesaî, M.R. (1373). *Enwaê Şîrê Farisî*. Şîraz.
- Feqîr, Ş.E. *Dîwan*, Nusxeya Fotokopî, Pirtûkxaneya taybet a A. Adak.
- Korkusuz, M. Ş. (2010) *Nehri'den Hazne'ye Meşayihî Nakşibendî*. İstanbul: Kilim Matbaacılık.
- Kurtuluş, R. Pala, İ. (2006) “Mülemma”, *DÎA*, cild: 31, r. 539;
- Pala, İ (2003). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*. İstanbul: L&M.
- Qeredaxî, M. 'E. (1998). *Bujandinewey Mêjûy Zanayanî Kurd*. Bexdad: Çapxaneya Wemîz.
- Qoxî, M. E. (2004). *Dîwana Camî'*, Stenbol: İhsan.
- Sêrtî, M. X. *Mecmûeya Helbestan (Destnivîsar)*, s. 1778, (Qopyaya eslê wê). Pirtûkxaneya taybet a Abdurrahman Adak.
- Varlî, E.M. (2004). *Dîwan û Jinewarî ya Ahmedê Xanî*. İstanbul: Sîpan.
- (2004) *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî yêd Mayîn*. İstanbul: Sîpan.
- Şemrexî, H. (Amd.) (2009) *Mem û Zîn*, Stenbol: Nûbihar.
- Cihanî, P. (Veî) (1363). *Ferhenga Nûbiha*. Urmiye: İntişarat Selaheddinê Eyyûbî.
- Yıldırım, K. (2011) *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*. İstanbul: Ağrı Kültür Yardımlaşma ve Dayanışma Derneği
- (2013). “Klasik Arap, Fars, Türk ve Kürt Şiirinde Mülemma” *Mulemmê'*, j. 1.
- (2008). *Ehmedê Xanî Külliyyatı Nûbehara Biçûkan*. Stenbol: Avesta
- Zinar, Z. (1991). *Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*. Stokolm: Yekîtiya Nivîskarên Kurd.

PÊVEK - I
DESTXETA MULEMME'Â EHMEDÊ XANÎ
(NUSXEYA ŞÊX EHMEDÊ FEQÎR)



PÊVEK - II
DESTXETA MULEMME'Â EHMEDÊ XANÎ (NUSXEYA CEWZÎ)



PÊVEK - III

DESTXETA MULEMME'Â EHMEDÊ XANÎ (NUSXEYA QOXÎ)

چا کوئشه آحمدي خاني قديس سيره
 قات عمرې في هوالك يا حبيبي كل حال
 آه و نا تم هم دسم شد ز فراقه ماه و سال
 گز بيم قائم دگرين چوقدن اولمش در حلال
 دين و ابتر بوم و عيشي من نأ عقل و كمال
 آنت فكري في فؤادي آنت روجي في الجسد
 نكده عمه يي توكلي دتم و براني كسره
 داده گلده عيشق آلتدن استريم سندن مدد
 وان تشاران بيزنه يفا عقل و دين و ملك و مال
 طالع غمي زاد هغي شاع سيري في المسلا
 تشنه جام و صالم چون شهيدى كز بلا

۳۷۶
 بو شه سن ديوانته اولدم نيجه حالم آي دلا
 يا ز نوقه عشوه يك دامين حبيبا چاف غزال
 يك معجزا نا حبيبي نست مني عالم
 هر دم آرد و فراقه غافل از حال من
 جان و دلدن عرض قديم حالي جاناته بن
 عرض حال امين نو غافل قط نه نرسى عرض حال
 هل لنا من نعمه وصل الحبيب من نصيب
 ايتا دم بر درش بي چاره ستر و ان غريب
 در دوزخ چو فلک سندن اوتد نوقه هيج نطيب
 آي طبيب من دوا و درد خاني هر و صال

PÊVEK - IV
DESTXETA MULEMME'A ŞEWQIYÊ XANÎ

هيك افنى شباي يا حبيبي في التعب
عشوق تو بكدخت جانم در جفا و تاري تب
عق

عقرو پشتم قالمدي صبر و كرام كندى هني
صوتنم ز داغا فراقى لودنا الم روزه و شب
قد مضى في المجرى يا حبيب الطف بنا
مانده ام يار و بغمخوار در رنج و عنا
كو رسم بركون و صاللك نيلرم كنج و عنا
كرين بختيم و ليري من بوجنه ناي و لقب
ليس للعشاق مقصود سوى وصل الحبيب
زار زوى و ضل كل بشد فغان عندليب
دلبرك و صلي دلبر عاشق علي رخم الرقيب
غير و صلا دلبري عاشق جدى ناكث طلب
قال في من اين جيت قلت من شهر الفراق
كفت كالاي تو كفتيم در دروخت تهتياق
سولاي دران ديدم و صلكه ديري مجنون باق
طالع و صلاه
صلاه

منذ اهلها القلوب و روح روحي في الجسد
نار عشق و در دل سوزان نهاده تا كبريد
اينترم مقصودمى سندن الين اقل ملامت
دلبري بدين بروى دلبري حجاب و بجهت
دنيا اغفر ذنب من نا جاك بالقلب سليم
كردكار رحمن كن بر بنده چيرا و سيقيم
فضل و احسانك و شريجاره قولك يا كريم
داغ و صلاه عفوئي شوقى خانى نسيت

PÊVEK - V

DESTXETA MULEMME'A ŞEWQIYÊ XANÎ
(NUSXEYA QOXÎ - YA LI CEM Z. ZINAR)

چار کوشه یاسوقی
 حُبِّكَ أَفْنَى سَبَابِي يَا حَبِيبِي فِي النَّعْبِ
 عَشِقُ نَوْكَدَانِي جَانِمِ دَرْجَبِ وَأَنْبُ وَنَبِ
 عَقْلٌ وَهُوسَمِ قَالَمِدِي صَبْرُ وَقَلَمِ كِنْدِي مَبِ
 صَوْتِمَهُ دَاغَا فِرَاقِي لَو دِنَالِمِ رُوزِ وَشَبِ
 قَدْ مَضَى فِي الْهَجْرِ عَمْرِي يَا حَبِيبِي الطِّفْ بِنَا
 مَا نَدَهْ أَمِ لِي يَا رُويِ مَمْنُونِ دَرْ رَجِ وَنَسَا
 كُورِ مِيشَمِ بَرْ كُونِ وَصَالِكِ نِيلَرِمِ كَنْجِ غِنَا
 كَرِ نَبِئِمِ دَلْبَرِي مِ نِ بُو جِنَهْ نَافِ وَلَقَبِ
 لَيْسَ لِلْعَشَاقِ مَقْصُودٌ سِوَى وَضَلِ الْحَبِيبِ
 زَارِ زُويِ وَضَلِ كَلِّ نَافِ نِغَانِ عَقْدِ لَيْبِ
 دَلْبَرِكِ وَضَلِي دِهَلَرِ عَاشِقِ عَلَي رَحْمِ الرَّقِيبِ
 خَيْرِ وَضَلَا دَلْبَرِي عَاشِقِ جُودِي نَا كِتِ طَلَبِ
 قَالَ لِي مِ نِ آيِنِ جِنْتِ قُلْتِ مِ نِ شَهْرِ الْفِرَاقِ
 كُنْتِ كَالَايِ نَو كُنْتِمِ دَرْدُ وَنَحْنُ نَحْنُ اِسْتِيقَاقِ
 سَوْنِلَدِي دَرْ مَانِ دِهَلِمِ وَضَلِكِ دِهَلِي مَجْنُونِ بَاقِ
 طَالِبِ وَضَلَا مِهْدِي صَابِرِ مِ نِ صَاحِبِ آدَبِ
 مَنذُ اَدَلِ خَالِقِ الْاَزْوَاجِ رُوحِي فِي الْمَسَدِ
 نَارِ عِشْقِمِ دَرْدِي سُوْرَانِ نِهَادَهْ تَا اَبَدِ
 اِسْتِرْمِ مَقْصُودِي سَنَدِنِ الْهَبِي قَلِ مَسَدِ
 دَا بِيئِمِ رُويِ دَلْبَرِي حِجَابِ وَيِ نَصَبِ
 رَبَّنَا اَلْحَمْدُ لَكَ نَبِ مِ نِ نَاجَاكِ بِالْقَلْبِ السَّلِيمِ
 كَرِ دِكَا رَا رَحْمِ كُنِ بِيْرُ بِنَدَهْ بِرُوسَلِيمِ
 فَضْلِ وَاِحْسَانِ دِهَلَرِ بِيجَانِ قَوْلَاكِ يَا كَرِيمِ
 دَا اِبْتِضَالًا حَوْ عَقْلُوكِ . شَوْ قَمِي . خَانِي نَسَبِ

PÊVEK - VI

DESTXETA MULEMME'A ŞEWQIYÊ XANÎ
(NUSXEYA QOXÎ - JI DÎWANA CAMI')

چارگوشه یاشوقی
حُبِّكَ أَفْنَى سَبَابِي يَا حَبِيبِي فِي النَّعْبِ
عِشْقُ تُوْبِكَ أَخْتِ جَانِمُ دَرْجَفَا وَتَابِ وَتَبِ
عَقْلٌ وَهُوسَمُ قَالْمَدِي صَبْرُ وَفَرَمُ كِنْدِي هَبِ
صُوتِيهِ رُدَا غَا فِرَا فِي لَوْدِ نَالِمُ رُوْزُ وَشَبِ
قَدْ مَضَى فِي الْهَجْرِ عَمْرِي يَا حَبِيبِي الطِّفْ بِنَا
مَاتَمَّهْ أَمِّي يَا رُوِي عَمَّ خَوَارِ دَرْ رَجِجِ وَعَنَّا

گۆز مېشتم بزرگون وصالک نېلریم گنج غنا
گر تېنېم دلبري من بو چنه نافي و لقب
ليس للعشاق مقصود سوى وصل الحبيب
زار زوي وصل كل باشه فغان عندي
دلبرك وصلی دېلر عاشق علی رعيم الرقيب
غير وصلاد دلبري عاشق چودي ناکت طلب
قال لي من اين جئت قلت من شهر الفراق
كفنت سكالاي نوگفتتم درد و محنت اشتياق
سوئيلدي در زمان ديدم وصلك ديدی بجنون باق
طالب وصلامه دي صابر بيتن صاحب ادب
منذ اذ لي خالق الازواج روجي في الجسد
نار عشقم درد لي سوزان نهاده تا ابد
استرم مقصود هي سندن الهی قل مدد
دا بېنیم زوي دلبري حجاب و بي نصب
ربنا اغفر ذنوب من تا جاك يا قلب السليم
گر دېکارا رخصم کن بزننده پيروستيم
فضل واحسان دېلر بيجانه قولك يا كريم
دا بفضلا خو عفوگي شوقی، خانی نسب

Extended Abstract

As a classical literature concept, “Mulemma” are the poems which are written not in one language but in two or more languages. In the history of the classical Kurdish literature, Ehmedê Xanî is recognized as the most significant figure in this style. Consequently, before him, in the frame of the Arabic, Persian and Turkish literatures, the mulemmas had been written in two languages. However, Xanî wrote a mulemma of four languages (Arabic, Persian, Turkish and Kurdish - Kurmanji) and elevated the level of it to superior point. This mulemma by Xanî spread in the history of the Classical Kurdish Literature and some other poet also wrote in four languages and one poet influenced by his four-language- mulemma and wrote in four languages is Şewqiyê Xanî. In this article, the mulemmas of Ehmedê Xanî and Şewqiyê Xanî were compared in terms of the comparative literature and the comparison mechanism was implemented.

In view of the fact that the mulemma comparison will be based on their texts, their texts became a primary part of the article. The texts of the mulemma were prepared in a critical way and during the preparation of the texts, the benefit from the manuscript was received and the dissimilarity of the texts has been demonstrated. In the works related to the comparative literature, having a good command of the second language (target language) is of great importance. In our work, we have compared our original documents. Furthermore, for those who cannot speak Arabic, Persian and Turkish, we translated the mulemma documents into Kurdish language as well.

In the article, the comparisons of both mulemma by their poets were performed in terms of characteristics in form and content. In this framework, the similarities and differences, things that the receiver/recepteur (Şewqiyê Xanî) copied from the sender/emetteur (Ehmedê Xanî) and the things which remained or appeared original have been determined.

On putting both mulemma poets side by side, we can see that they are both poets of the classical period, are in touch with the elites in the period mentioned, and members of madrasah and sects. However, a century, the cities, madrasah and Kurdish thinking are diverse from each other. Accordingly, both mulemmas written by two poets present a great deal of discrepancies in many characteristics. One of the main difference between them is Ehmedê Xanî is a poet having a work of art and one of the famous figure in Kurdish Literature. On the contrary, Şewqiyê Xanî doesn't have a work of art and is not well-known up to now. It is the first time time his information about him has been revealed in the North.

When people examine the comparison in terms of form and expression are evaluated, it is clear that the mulemmas are in common in unit of the nazm, form of the nazm, qafiyah, rhythm and style. In the details of these items, 3 principal differences are seen: 1. The Ehmedê Xanî's Mulemma has 5 bands (rows), but Şewqî's

has six bands (rows). 2. Both of the mulemmas were written in terms of serwa of murebba, but the voice (phonetics) and style of them are dissimilar. 3. Xanî used the Serhed accent, but Şewqî Xanî used the Culmêrgê accent.

Şewqiyê Xanî is found to be affected from Ehmedê Xanî not only in form and the poem style but also in the usage of the meaning and expressions. In the Şewqî's mulemma, the existence of the dialogue between the lover and the loved one and the change of address to God reveals the strong points of Şewqî Xanî as the originality and strength. In general, the rate of Ehmedê Xanî's originality is superior to that of Şewqî Xanî's, which clearly exhibits the Ehmedê Xanî's influence level on Şewqî and his following him. As known, in the classical literature, the poems written with form of the nazm, rhythm, qafiyah and radif are named as "nazire". When we take both mulemmas into consideration at a higher level of resemblances, Şewqî Xanî's mulemma could be acknowledged to be as the nezire of Xanî's up to a level.

It is clearly seen that Ehmedê Xanî not only made an impression on people through his works of art but also influenced people after him through his poems, as well. In other words, Xanî had an effect not only in mesnewis of love, dictionary and eqîdenamas written in verse, but in some styles, too. As some poets followed him through his "Mem û Zîn" and "Nûbihara Biçûkan", the others went after him though his poems, and Şewqî Xanî is one of the very important and unique example to show.